Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1065 | 17-Gulan- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Ocalan bi pirtûkên xwe li Tebqayê bû

**Yekîtiya Jinên Ciwan a Tebqayê, di çarçoveya hemleya "Jin jiyan azadî, em dê azadiyê bi dest bixin" ji bo piştgiriya serhildana jinan li Îranê û belavkirina felsefeya Rêber Abdullah Ocalan, pêşangeha wêne û pirtûkan li dar xist.**

Aya Silêman got, çalakiya wan ji bo piştgiriya serhildana jinan li Îranê ye, û ji bo ku dengê xwe ragihînin cîhanê, û hemleya wan a belavkirina felsefeya Rêber Abdullah Ocalan dewam dike.



Pêşangeh li parka Navenda Çand û Huner a Tebqayê, bi beşdariya nûnerên Rêveberiya Sivîl a Demokratîk, meclisên leşkerî, partî, tevgerên ciwanan, nivîsgeh û komîteyên jinan li dar ket.

Endama rêveberiya Yekîtiya Jinên Ciwan Aya Silêman destpêkê axivî û got, "Şoreşa jinan, şoreşa azadî, exlaq, bedewî û rûmetê ye."

Aya Silêman, destnîşan kir ku Rêber Abdullah Ocalan bawer dike ku jin dikare civakê bi rê ve bibe, ji ber wê, divê jin, zanebûn û serhildana li hemberî zilmê û koletiyê belav bike. Hemleya "Jin jiyan azadî, em dê azadiyê bi dest bixin" ji bo piştgiriya serhildana jinan a Rojhilatê Kurdistanê, Îranê û belavkirina felsefeya Rêber Abdullah Ocalan, wê dewam bike.

# Li Nemsayê navê jîna Emînî li kolanekî hat kirin

Navenda nûçeyan

**Berpirsyarên Nimsayê ragehandin ku wan navê jina Kurd Jîna Emînî ya ku li ser destê polîsê Exlaq yê girêdayî rêjîma Îranê hatibû qetilkirin, li kolanekê kirin e.**

Herwiha dan xuyakirin ku ev yek care ku navê Jîna Emînî li kolanekê li cîhanê tê kirin, Ev jî piştî dengdana endamên şaredariyê pêk hat.

Hêjayî gotinê ye ku piştî qetilkirina



Çîgera şaredariya Viyêna û endama partiya sosyala demokratîk li nimesayê ragehand ku wan ji bo bişgiriya bi Jîna Emînî re û serhildana jinan li Îranê re, wan navê Jîna Emînî li n kolanekê li Viyêna ya Nimsayê kirin.

Herwiha partiya sosyalîst a demokratîk û şaredariya Nimsayê bi daxuyaniyekê piştgiriya xwe ji serhildana gel ya li Îranê, ragehandin.

Jîna Emînî li ser dstê rêjîma Îranê, gelek welatên cîhanê piştgiriya xwe bi serhildana re ragehandin û navê Jîna Emînî li gelek kolan û taxên hat kirin.

Di heman çarçoveyê de şaredariya otawa a Kendayê, ji bo pişgiriya serhildana jinan li Îranê ,biryar da ku ewê navê beşek ji kolana li beramberî balyozxaniya Îranê li Kendayê, bike Jîna Emînî.

# Sûlava Xelef û Çîroka Wê

**Sûlava Parmûk an jî bi navekî din sûlava Xelef yek ji sûlavên Çewlîgê ye ku bi serpêhatî û çîroka xwe him balê dikişîne ser xwe hem jî bi salan e bê west û rawest dikişe û diherike.**



Sûlava ku havînan bo geşt û ger û wênegiriyê dibe mekaneke xweş zivistanan jî diqerise û dîmenên krîstalî û nebinayî pêşkêşî niştecîhên gund û hezkiriyên xwe yên derve dike, lê her çiqas bi van dîmenên xweş li ber çavan be jî di esasê xwe de çîrokeke dilşewat jî di nav xwe de dihewîne.

Sûlava ku hetanî demên dûvdirêj navê gund lê bû, piştî mirina kesekî navê xwe jî mînanî qedera xwe diguherîne, li gorî saloxên gundiyan mesele wiha rû dide; "Rojekî kesekî bi navê Xelef bo hinekî bêhna xwe vede û kêliyekî hênikahiyê de rûnê çûye li ser sûlavê, lê qedera kambax lê hatiye xezebê û Xelef ji sûlavê ketiye xwarê û xeniqiye. Termê wî yê ku bi deh metreyan xişikiyaye paşê ji aliyê gundiyan ve hatiye dîtin. Êdî ji wê rojê û vir ve navê vê derê bûye Sûlava Xelef.

**Çûnûhatina Sûlavê**

Ev gundê ku girêdayî Çewlîgê (Çolîg, Bîngol) ye bi qasî 20 xolekan ji navenda bajêr dûr e. Ji nav bajêr merov dikare bi wesayîtên gund û bi erebeyên xwe yên şexsî here gundê Parmûkê (Çavuşlar) û li vir Sûlava Xelefê bibîne.

**Debara Gund**

Debara gund bi heywandarî û çandiniyê dibe û hin gundî ji bona ku karbikin diçin derveyî bajêr jî.

**Zaravayê Gundiyan**

Piraniya niştecihên gund bi zaravayê (Zazakî diaxiv) in û gelek ji wan Kurmancî jî baş dizanin. Her wiha li gund Girê Keçel, Ava Serkaniyê û Aşê Kevir jî hin cihên hêjayî dîtinê ne.

Sudoku: Bersiv 74

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 3 | 1 | 5 | 7 | 4 | 8 | 9 | 2 |
| 8 | 2 | 7 | 1 | 3 | 9 | 6 | 5 | 4 |
| 9 | 5 | 4 | 6 | 8 | 2 | 7 | 1 | 3 |
| 7 | 6 | 5 | 9 | 2 | 3 | 1 | 4 | 8 |
| 1 | 4 | 3 | 8 | 5 | 7 | 9 | 2 | 6 |
| 2 | 9 | 8 | 4 | 6 | 1 | 5 | 3 | 7 |
| 3 | 8 | 6 | 2 | 1 | 5 | 4 | 7 | 9 |
| 4 | 1 | 2 | 7 | 9 | 8 | 3 | 6 | 5 |
| 5 | 7 | 9 | 3 | 4 | 6 | 2 | 8 | 1 |

Sudoku:Pirs 75

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 5 | | | | | | 6 | 4 |
| | | | 2 | | 4 | | 9 | |
| | | | | | 1 | 7 | | 2 |
| | | | 9 | | 3 | 4 | | 8 |
| 9 | | | | 2 | | | | 1 |
| 5 | | 3 | 4 | | 8 | | | |
| 1 | | 9 | 8 | | | | | |
| | 4 | | 1 | | 6 | | | |
| 2 | 7 | | | | | | 1 | 9 |

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| **Ajanda** (Fransaî) | **Bername, rojev, plan, program** |
| **Bendav** | Ciyê ku av lê tê sekinandin. Benda avê, sikir, sike |
| **Destwerdan** | 1. Tevlîbûna tiştekî di aliyê neyînî de. Mûdaxele: Dest li karê me werdan. 2. Sererastkirina karekî: Dest lê werda, xwe tevlî kir |
| **Gundewar** | Gund û deverên derveyî bajaran |
| **Jêder** | Çavkanî, serkanî, ciyê ku tiştek jê tê: Çavkaniya vê nûçeyê ne saxlem e. |
| **Jîngeh** | 1. Ciyê mirov lê dijîn. 2. Derdor, xweza, tebîet |
| **Kanal** (Fransî) | 1. Co, ciyê kûr yê av tê re diçe. 2. Dezgeha televizyonê. 3. Rê, rêçik |
| **Nexasim** | Nemaze, bi taybetî. Dengbêjên berê pir xweş dikirin, nexasim Mihemed Arif |
| **Rêje** | Mezinayî, pirbûn-kêmbûn, di aliyê dereceyê de girêdana di navbera du tiştan, yan di navbera parçe û tevayiyekê de. Nisbet: Rêjeya xwendekarên serkeftî ji sedî 80 ye |
| **Şênî** | Kesên li tax, gund, bajarok, navçe û bajaran dijîn: Şêniyên gund dîlan girtbûn |




## Tecrîd sûcekî dijmirovî ye

Dewleta Tirk a dagirker roj bi roj tecrîda li ser Rêber Apo girantir dike, hevseroka Meclisa Edaletê ya herîma Efrîn Evîn Hac Hemo diyar kir ku tecrîd sûcekî dijmiroviye û got, tevî ku dewleta Tirk a dagirker tevahiya zagon û peymanên navnetewyî yên mafê mireovan bin pê dike jî, sazî û rêxistinên navnetewyî ji bo berjewndiyên xwe, xwe bêdeng dikin.**R-5**

## Rêgehên Asayîkirina Têkiliyan bi Şamê re û Niyazên Dewletan

Piştî deh salan ji şerê çekdarî yê kirîza Sûriyê, di vê dema dawî de hêmanên qonaxeke nû dest pê kir û diyar dibe, bi navnîşana asayîkirina peywendiyên bi Şamê re. Bi liv û tevgera dîplomatîk li Şamê û ji aliyê komkara erbî, herêm û cîhanî ve, ji milekî din ve jî kikumeta şamê jî seredanên li pey hev li hinek paytextên Erebî kir. **R-4**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1065 | 17-Gulan- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# KOMKUJIYA HEWLÊRÊ Û XETA XIYANETÊ YA PDK'Ê

Dîroka PDK'ê bi xiyanetê dagirtiye, ji sala PDK avabûyî heya niha dijî Kurdan bi neyarên Kurdan re di nava têkiliyan deye û dijî Kurdan komkujiyan pêktîne. Yek ji xiyaneta PDK'ê, Komkujiya Hewlêrê ya di 16'ê Gulana 1997'an deye. Di encama êrişa bê bext de nêzî 80 gerîlayên PKK'ê yên birîndar ku di nexweşxaneya Hewlêrê de diman û xebatkarên nexweşxaneyê hatin qetilkirin. Hîn jî cenazeyê şehîdên Hewlêrê radestî malbatên wan nehatine kirin.R-3



## Jina kurd a têkoşer: Leyla Qasim



Beriya 49 salan şervan jin ya Kurd Leyla Qasim di 22 saliya xwe de ji ber nêrînên xwe yên siyasî bi ehvalên xwe re hate darvekirin. Leyla Qasim yekem jina ku li Başûrê Kurdistanê ji aliyê rejîma Baasê ve hatî darvekirin e.**R-2**



## Meclisa Kantona Efrîn û Şehbayê banga bidawîkirina dorpêçê kirin

Cîgirê hevseroketiya Meclisa Kantona Efrîn û Şehbayê Cemal Reşîd banga bidawîkirina dorpêça li ser kantona Şehbayê kir û destnîşan kir ku eger dorpêç bidome dê karesetên mirovî yên mezin encam bide.**R-3**

## Pêşketinên Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di Şoreşa Rojava de




Di şoreşa Rojavayê Kurdistanê de yek ji serkeftinên herî mezin avakirina sîstema xwendinê û vejînkirina zimanê dayîkê bû. Zanîngehaên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi fikirên moderNîteya Demokratîk tên birêvebirin. Girêdayî vê yekê hevserokê zanîngeha Rojava Şînda dawod anî ziman ku "zanîngeha Rojava xwe îsbat kir û em bi zanîngehên cîhanê re di nava têkiliyan de ne."**R-6**

## 2`yemîn Festîvala Orkêş A Mûzîk û Stranan bû dengê gelan

Bi beşdariyeke mezin a şêniyan û bi tevlêbûna 30 komên ji Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, bi dirûşma "Bi dengên pîroz şoreş ava dibin" 2`yemîn Mîhrîcana Mûzîk û Stranan a Orkêş li Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo hat lidarxistin.**R-7**







DILYAR CIZÎRÎ
**Insyatîfa Rêveberiya Xweser û dengvedana wê** *R-4*



Zekî Bedran
**Erdogan nekarî serkeftinê îlan bike** *R-5*



Farûk Sakîk
**Pêla nîjadperestî û bawerîanîna bi derewan** *R-5*

# Bav nehişt lê tevgera azadiyê xewna wê pêk anî

**“Xewna min a ku te nehişt ez bi dest bixim, tevgera azadiya Kurdistanê ji min re pêk anî” jineke Kurd a 60 salî bi van gotinan, bavê xwe muxteb girt. Jina 60 salî kevneşopiyên civakî qetandin û xewna xwe ya fêrbûna bi zimanê zikmakî pêk anî.**

Emîra Ebdo, ji ber kevneşopiyên berê neçû dibistanê û ji fêrbûnê bê par ma. Bav û birayê wê bi hinceta wan urf û adetan ku nabe zarokên keçîn biçin dibistanê, nehiştin ku Emîra di 6 saliya xwe de biçe dibistanê.



Hesreta xwendinê sal bi sal li ba Emîra zêdetir dibû, ku ew niha dayika 3 keç û 4 xortan e. Emîra behsa serpêhatiya xwe ya wê demê kir û got: “Daxwaza min a fêrbûn û xwendinê mezin bû. Lê belê bav û birayê min bi bihaneya adet û kevneşopiyan nehitşin ez vê daxwaza xwe pêk bînim. Ev adet li ser jinan û civakê serwer bû. Di encamê de ez bûm jineke nexwende.”

Emîra heta salên 90`î yên sedsala borî bê xwendin ma. Lê dema serdana cîraneke xwe dike, li wir tevgera azadiya Kurdistanê nas dike. Pê re rêwîtiya fêrbûnê lê vê carê bi zimanê Kurdî dest pê dike. Dema Emîra 30 salî bû xewna wê pêk hat. Tevî 9 jinên din alfabeya kurdî fêr dibe. Têkildarî wê got: “Em pêşî fêrî tîpan bûn. Hêza fêrbûnê li ba me mezin bû, me her tişt li paş xwe hişt û me xwe ji fêrbûnê re vala kir.”

Ji bo ku tiştê ku fêr bûye ji bîr neke, Emîra dîwana helbestvanê mezin Cegerxwîn peyda kir. Emîra piştrast kir ku wê dersên zimanê Kurdî dan 30 zarokan, 4 ji wan niha şervanên tevgera azadiya Kurdistanê ne.

Piştî Şoreşa 19’ê Tîrmeha 2012’an a Rojavayê Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, Emîra Ebdo di komîteyeke lihevanînê ya Kongra Star a Qamişlo de cih girt. Her wiha ew, neviyên xwe fêrî zimanê Kurdî dike. Di derbarê vê yekê de got: “Ziman jî yek ji hêmanên sereke yên çand û dîroka civakan e.”

Emîra bang li jinên ku nizanin bixwînin û binivîsin kir ku bi zimanê xwe yê zikmakî fêr bibin û wiha domand: “Bila temen li pêşiya pêkanîna armancên wan nebe astengî. Bila hemû jin zimanê xwe yê zikmakî fêr bibin û keç û xortên xwe fêr bikin. Ji ber ku civak bi zanist û xwendinê bi pêş dikevin.”

Emîra 2 caran serkeftin bi dest xist, cara yekê dema kevneşopî têk bibin û cara din dema xewna xwe ya fêrbûna, xwendin û nivisînê bi dest xist. Emîra gotina ku rojekê ji bavê xwe re gotibû bi bîr anî û got: “Xewna min a ku te nehişt ez bi dest bixim, Tevgera Azadiya Kurdistanê ji min re pêk anî. Çavên me ronî kirin, em zana û rizgar kirin. Bendên ku jin bindest kirin, şikandin.”

# Mamostaya girtî ya Îranî, dest bi çalakiya greva birçîbûnê kir

**Endama Konseya Koordînasyona Rêxistina Sendikayan ya Îranê ragihand ku mamosta Atîka Recebî ji roja hatî girtin ji 9’ê Gulanê heta niha di gireva birçîbûnê de ye.**

Li Îran û Rojhilatê Kurdisatnê ji 16’ê Îlonê ve di serhildana ku berdewam dike de akademîsyen, hunermend û rojnameger jî di nav de bi sedan kes hatin girtin.

Yek jî kesên ku hatin girtin parêzvana mafê mirovan û Mamosta Atîka Recebî ye. Atîka Recebî bi pêşengtiya Konseya Koordînasyona Rêxistina Sendîkayan ya Îranê di 9’ê Gulanê de li ber avahiya rêveberiya perwerdeya eyaleta Razavî di dema xwepêşandanê de hate binçavkirin û girtin.

Hat zanîn ku ji 9’ê Gulanê ve Atîka Recebî di çalakiya gireva birçîbûnê de ye. Di 9’ê Gulanê de dema ku hatî binçavkirin polîsên Îranê li ser mala wê de girtine û xwişka wê jî hatiye binçavkirin û piştre hatiye berdan.



Atîka Recebî di 11’ê Gulanê de di hevdîtina bi telefonê ya ku bi malbata xwe re pêk anî de, destnîşan kir ku ji ber bê qanûnî tê darizandin dest bi çalakiya gireva birçîbûnê kiriye.

**‘Ji rewşên neyînî yên ku rû bide meqamên edlî berpirs in’**

Konseya Koordînasyona Rêxistina Sendîkayan der barê mijarê de daxuyanî da û da zanîn ku ew derbarê tenduristiya endama xwe mamosta Atîka Recebî de bi fikar in û got ger tiştek neyînî çêbibe polîsên Îranê û meqamên edlî ji rewşê berpirs in.

Atîka Recebî ji roja destpêkê ya serhildanê heta niha ders boykot kiriye, di nava mamostayên ku bi awayek çalak beşdarî serhildanê bûyîn de ye.

# Jina kurd a têkoşer: Leyla Qasim

**Beriya 49 salan şervan jin ya Kurd Leyla Qasim di 22 saliya xwe de ji ber nêrînên xwe yên siyasî bi ehvalên xwe re hate darvekirin. Leyla Qasim yekem jina ku li Başûrê Kurdistanê ji aliyê rejîma Baasê ve hatî darvekirin e.**

Leyla Qasim di 12’yê Gulana 1974’an ji hêla Rêjîma Baasê ve hat darvekirin. Leyla Qasim jinek têkoşer a kurd e, di sala 1952’yê de li gundê Bamîlî ya navçeya Xaneqînê ya parêzgeha Diyala ji malbatek hejar û welatparêz a kurd hatiye dinê. Leyla di 20 saliya xwe de di nava Yêkitiya Xwendekarên Kurdistanê de cih digire, xebat û têkoşîna xwe bi rê ve dibe. Leyla ji bo mafê gel di nava têkoşînê de cih digire.

### Hêza jinên kurd şênber kir

Ew di nava malbatê de keça bi tenê bû. Serhildêr û ji dil bû. Bavê Leyla cotkarî dikir. Dibistana navîn li dibistana bi navê Wend xwend û serkeftî bû. Leyla di zarokatiya xwe de gelek zindî bû. Tevî ku malbatek xizan bûn jî bavê Leyla dixwest ew bixwîne. Piştî dibistana



seretayî wê tevî malbata xwe ji ber xizaniyê di sala 1958’an de koçî Bexdayê kir. Wê her dem parastina doz û têkoşîna gelê kurd ji bo xwe peywirek gelek girîng û mezin didît. Wê dibistana amadeyî li Bexdayê qedand. Piştre beşa Civaknasiyê ya Zanîngehê qezenç kir. Leyla dema 20 salî bû Yekitiya Xwendekarên Kurdistanê nas kir û gotarek nivîsand. Wê gotara xwe li ser dijminatiya Seddam Husên a li dijî gelê kurd nivîsand û ji ber vê hedef hat girtin.

Di sala 1972’yan de di nava bajarê Bexdayê de liv û tevger û têkoşîna Yekitiya Xwendevanên Kurdistanê tevî zextên îstixbarata Baas’ê ya Iraqê her ku diçû zêde dibû. Wan salan piraniya hêz û şoreşa kurdan di bin rêbertiya PDKI de li çiyayên Başûrê Kurdistanê û herêmên azadkirî de civiyabû. Ji bo wê jî dema Leyla Qasim dît ku herkes dibêje; kurd tenê dikarin li gund û çiyan serî hildin û jin nikarin tevî karê mêran û xebata şoreşgerî bibin û xebatên jinan ji yên mêran cuda ne, lê Leyla biryar da ku tevî xwendevanên ciwan bi awayekî çalaktir û berfirhetir xebata xwe ya kurdayetiyê li bajarên Iraqê û bi taybetî jî li Bexdayê zêdetir bike.

### Dixwest denge kurdan li cîhanê bide bihîstin

Di 24’ê Nîsana 1974’an de Leyla Qasim li gel çar hevalên xwe yên bi navê; Cewad Hemewendî, Nerîman Fuad Mestî, Hesen Hemereşîd û Azad Silêman Mîran di encama operasyonek berfireh a hêzên rejima Baas de li Bexdayê hatin girtin. Dema li girtîgehê bû bi êşkenceyên mezin û dijmirovî re rû bi rû hat hiştin, lê nekarîn tu îftirayek jê wergirin.

Leyla Qasim jinek têkoşer û bi cesaret bû, dema ku îstixbarata rejima Baas Leyla Qasim dabûn ber lêpirsînê Leyla Qasim ji wana re wiha gotibû; “Min bikujin, lê vê rastiyê jî zanibin ku bi kuştina min dê bi hezaran kurd ji xewa giran şiyar bibin. Ez gelek kêfxweş û serbilindim ku ezê giyanê xwe fedayê rizgariya Kurdistanê bikim.”

Rejima Baas ji bo çavtirsandina gelê Kurd bi taybetî jî ciwanan, tevî ku du hefte di ser girtina Leyla Qasim û hevalên wêre derbaz nebibû jî, di dadgehek ne dadperwerde biryara bidarvekirinê li Leyla Qasim û hevalê wê hate birîn. Di saet 07:00’ê sibeha 12’ê Gulana sala 1974’an de Leyla Qasim tevî çar hevalên xwe hate darvekirin.

### ‘Qeftek ji pora min bibirin bi kêla min ve girêbidin’

Piştî darvekirina Leyla Qasim û hevalên wê demek zêde derbaz nebû birayê Leyla Qasim yê bi navê Selamî li Bexdayê bi behaneya ku wêneyên xwîşka xwe Leyla Qasim belav kiriye ji aliyê Baasiyan ve hate kuştin.

Rojek ji beriya Leyla Qasim were darvekirin rejima Baas destûr dide dayîk û xwişka wê li girtîgehê Leylayê bibînin. Di hevdîtina bi dayîk û xwişka xwe re Leyla ji xwişka xwe re dibêje; “Meqes û desta cilên min yên Kurdî ji bîr nekin, xwişka wê bi şaşmayî jêre dibêje meqes ji bo çiye? Leyla dibêje; “Qeftek ji pora min bibirin bi kêla min ve girêbidin. Dema Kurdistan azad bû hûnê pora min bi hewayê azad yê Kurdistanê de berdin, cilên min yên Kurdî jî ji bo wê rojê ye dema ku ez bibim bûka Kurdistanê.”

### Bi hezaran malbatên kurd navê Leyla li zarokên xwe kirin

Piştî bidarvekirina Leyla Qasim li seranserî Kurdistanê bi hezaran malbatên Kurd navê Leyla li zarokên xwe kirin. Leyla Qasim bû çîrok û destan di helbestên helbestvanên mezin yên wek Cegerxwîn, Hêmin û gelek helbestvanên din de.

Nivîskar Rêzan Ezîz derbarê zîrektî û fikrê netewî yê jina Kurd Leyla Qasim de got; “Leyla Qasim ji bo Kurdan mirovek mezin e. Leyla jina yekeme ku di wê demê li ser fikir û baweriya xwe ya siyasî, tê darvekirin. Di zindanê de gelek êşkence li Leyla tê kirin. Leyla ji endmaên saziya îstîxbaratê re dibêje ‘Bi kuştina min wê hezaran Kurd ji xewa nezanînê hişyar bibin. Ez gelek serbilind û kêfxweşim, ji ber ku canên xwe li ber rizgariya Kurdistanê feda dikim.”



# 2`yemîn Festîvala Orkêş A Mûzîk û Stranan bû dengê gelan

**Bi beşdariyeke mezin a şêniyan û bi tevlêbûna 30 komên ji Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, bi dirûşma “Bi dengên pîroz şoreş ava dibin” 2`yemîn Mîhrîcana Mûzîk û Stranan a Orkêş li Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo hat lidarxistin.**

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Ji aliyê Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê û Tevgera Çand û Hunerê ya Mezopotamyayê, 2’êmîn festîvala Orkêş a Mûzîk û Strana li navenda Mihemed Şêxo A Çand û Hunerê a bajarê Qamişlo hat lidarxisatin, di festîvalê de, ji bakur û rojhilatê Sûriyê 30 komên mûzîk û stranan beşdar bûn. Herwiha gelek şêneyên herêmê ji tevahiya pêkhateyan beşdar bûn.

Derbarê 2’êmîn festîvala Orkêş a Mûzîk û Stranan, endamê Koma Mîrateya Reqayê Melek Elhetêm û endamê Koma Gîvara ya bajarê Kobanê Ciwan Temo ji rojnameya me re axivîn.




### ` Festîval çandên gelên herêmê tîne cem hev `



Melek Elhetêm da zanîn ku festîvala Orkêş e mûzîkê, naskirina kevneşopiyên tevahî gelane û wiha got: “Ez peşdarî festîvala Orkeşê a yekemîn bûm, her wiha ev tevlîbûna min ye 2`e mîn e. Armanca van festîvalan xurtkirina nasîna di navbera koman û gel de ye, di heman demê de di festîvalê de kevneşopiyên gelê Ereb, suriyan, kurd û tevahî gelan tên naskirin. Erka me ye ku em mîrateya tevahiya gelan biparêzin û bihêz bikin, da ku tevahî gel bibe destek û ferq cûdahiyê di navbera gelan de dernekeve. Festîvala Orkêş rihê yekîtiya tevahî gelan ava dike.”

Melek wiha berdewamî da axaftina xwe û got: “Mîrateya di navbera komên civakê de, danûstendina çand û şaristaniyên kevnar e, her wiha ji bo di navbera van koman de ruhê hezkirin û nêzîkbûnê çêbibe pêwîstî bi festîvalan heye. Divê civak nekeve nava parçebûneke ku dagirkeriya Tirk ji bo wê plan dike, em bi riya hatina li cem hev, planên dijmin têk dibin.”

### `Ji bom parastina Çandê em ê tekoşînê xurtir bikin’

Endamê koma Mîrateya Reqayê Melek Elhetêm axafdtina xwe wiha qedand: “ Hêvîdarim her sal feswtîvala Orkêş were lidar xistin û ji bo gelan bibe serkeftinek li hember hêzên dijmin, bi taybet dewleta Tirk a faşîst. Her wiha hêvî dikim ku hezkirin û nasîn di nava tevahî civakên me de zêdetir bibe, em ê li ber xwe bidin, bi berxwedana lehengên xwe, bi xwîna şehîdên xwe, bi têkoşîna xwe ya dîrokî û çandî , e mê bi serkevin.”

### ` Çand û mîrateya kurdî hebûna kurdan îspat dike `



Di heman çarçoveyê de endamê Koma Gîvara ya bajarê Kobanê, Ciwan Temo wiha got: “Em yekem car bi koma Botan re, beşdarî vê festîvalê bûn, her wiha me li ser navê Koma Botan stiran pêşkêş kirin. Ev nêzî 15 rojan e, em ji bo beşdarbûna vê festîvalê xwe amade dikin. Armanca me ji festîvala Orkêş, vejîna mîrateya kurdî ye, ku yek ji wan tiştên ku dagirkeriya Tirkiyê dixwaze ji holê rabike û tûne bike. Di heman demê de, Ji bo parastina nasname û dîroka kurdan, çand û mîrateya kurdan e, ku dîroka hebûna çanda kurdî û koka wê ya di dîroka kevnar de ji hemû cîhanê re îsbat dike.”

### ` Dîrok û çanda me zengîn e `

Ciwan diyar kir ku ev festîval li hemberî dagirkeriya dewleta Tirk û hemû aliyên dijmin ên ku armanca wan tunekirina gelan e, berxwedaneke duyemîn e, û wiha got:”Me sê stran pêşkêş kirin, 2 ji wan nû hatina nivîsandin û yek jî ji stranên mîrateya kurdî ye. Ev festîval li hemberî dagirkeriya dewleta Tirk û hemû aliyên dijmin ên ku armanca wan tunekirina gelan e, berxwedaneke duyemîn e, ev gav tê wateya bihêzkirina îradeya gelê kurd, her wiha ev bersiv dide dewleta Tirk a faşîst ku tu kes nikare gelê Kurd tune bike. Li herêmê Kurd, Ereb û Suryan jî hene, dîroka me yek e û jiyana me hevpar bû û hîna jî heye, ev jî dîroka kevnar û yek çand e ku me bi hev ve girê dide, em her tim hewl didin ku yek dest bin û demokrasiyê ava bikin. bê ferq û cûdabûyîn bijîn.”

### ` Tîmên ku beşdarî festîvalê bûn `

Di 11`ê Gulanê de festîval hat destpêkirin, bi bîranîna şehîd Mizgîn û şehîdên çand û hunerê festîval hat vekirin.

12`ê Gulanê roja 2`e mîn afestîvalê bû, ji bajarê Kobanê, Koma Botan û Koma Hevrîn beşdarî festîvalê bûn, ji bajarê Tebqa yê jî Koma Duret Elfirat, Doser beşdar bûn, Her ji bajarê Dêrikê koma Cûdî tevlî bû, di heman demê de Koma Şehîd Serhed a bajarê Rimeylanê jî pêşdar bû.

13`ê Gulanê roja 3`mîn a festîvalê, Koma Botan ji bajarê Qamişlo, Koma Tolhaldan ji bajarê Hesekê, Koma Girstêrk ji bajarê Hesekê beşdar bûn, her wiha ji bajarê Reqa Koma Reqaq, ya ji bo vejîna mîrateyê, koma Roja Walat ji navçeya Gerbawî ya bajarê Qamişlo jî pêşdarî festîvala Orkêş bûn.

14`ê gulanê roja 4’mîn Koma Zîlan ji bajarê Dirbêsiyê, Koma Şehîd Xebat a terbespiyê, Koma Elfateria ji Dêrikê, Koma Muzîkê ji Hesekê, Koma Sarhildan ji Rimeylan û her wiha Koma Şoreş ji Til Temrê beşdar bûn.

15`ê Gulanê de, koma Bawer ji taxa Qedûrbêk ya bajarê Qamişlo, koma Stêra Zirîn, koma Efrînê û koma Yak Bar ji bajarê Qamişlo jî beşdar bûn, Koma Şehîd Aleniya ji Rimeylanê û Koma Agrî ji Amûdê pêşdar bûn.

Di roja dawîkirina festîvalê de roja 16`ê gulanê, dê encamên pêşbirkê bên pêşkêşkirin û wê kom bên xelatkirin.

Li gorî komîteya amadekar a festîvalê, 2 komên ji Bakûrê Kurdistanê ji ber girtina deriyê sînorî Sêmalka yê, dikeve bakûrê rojhilatê Sûriyê û Başûrê Kurdistanê de, nikarîbûn peşdarî festîvalê bibin.

# 41 Destanên Kurdî


**Mihemedê Pîrê**

**Sal 1986-96 di wan salên ku min lêkolîn li berhemên Folklora Kurdî dikir de, 1.710 perçe folklor ketibûne destên min û min ew di deh cild pirtûk de bi navê ”XWENÇE” di tarîxên cuda de weşandin.**

Di nava wan berheman de 23-25 Destanên Kurdî hebûn. Hinek ji wan tenê stranek li ser wan destanan hatiye gotin, hinek jî çîroka wan, serpêhatiya wan bi kurtî hatiye gotin.

Çend roj berî niha, min li rûpela xwe ya Facebookê kurtenivîsek weşand û min pirsî ka kêî dizane ku çend Destanên Kurdî hene?

Van biraderên ku navê wan li jêrê ye, her yekê çend navê destanan li binê nivîsa min nivîsîbûn:




Acar Can, Onur Cebe, Wedat Urtekin, Rêdîr Ceifer, Mesut Bilir, Faruke Feroyi, Hesenê Ale, Armîs Keyxusrew, Dilêr Dêrik, Cercîs Yousif, Mouhrram Cankurd, Dilêr Dêrik, Taha Aslan, Sores Bladhede, Taha Aslan, Aydin Uneşî û Cemal Firat. Sipasiyên germ ji bo hemû biraderan…

Ji van destanên kurdî yên li jêrê, çend ji wan menşûr in û her kes bi wan dizane wekî Mem û Zîn, Siyabend û Xecê û hwd. Lê hin ji wan zêde kes pê nizane.

Hêvîdar im ku ev nivîs bibe rêvekerek ji bo ciwanên me yên nûhatî ku li van destanan lêkolîn bikin û naveroka wan derxin holê, binivîsin û bikin malê mêjû.

Min navê hin destanên ku dubare hatibûne nivîsandin ji navê derxistine û tenê yek hiştiye, li gor rêza alfabeyê 41 Destanên Kurdî ev in li jêrê:

1- Bavê Fexrî
2- Bavê Şikrî
3- Bersisê Abid
4- Binefşa Narîn
5- Bozanê Lawê Pîrê
6- Bozê Zerî û Xişmanê Heyderî
7- Cembeliyê Mîrê Hekariyan.
8- Derwêşê Evdî û Edûlê
9- Dewrêşê Evdî û Edolê
10- Elo Şêxanî yan jî Kerr û Kulik
11- Ferhad û Şêrîn

12- Elo û Fatimê
13- Evdalê Zeynikê
14- Ezdîn Şêr Beg
15- Ferx û Sitî
16- Gûrîyê Qedê
17- Heso û Nazê
18- Hovekê Misûsanî
19- Kalê Ristem
20- Kawayê Hesinkar
21- Kela Xursê
22- Keleha Dimdimê
23- Kurê Ruyal û keçika Çiyayê Qereçûxê
24- Lelîxan û Hesam
25- Mem Axayê Şikakî
26- Mem û Zîn / Memê Alan
27- Qewlê Hespê Reş e
28- Rostemê Zal
29- Senem û Husên
30- Sêva Haciya

31- Siyabendê Silîvî û Xecê
32- Siyabendê Silîvî û Elîfa Emer Axa
33- Stî û Ferxî
34- Şerê Ereban û Êla Milan
35- Şêwlê Mezrayî
36- Tahir û Zahirê
37- Ûsibê Nebiya
38- Xelefê Şovî.
39- Xelîl Bego
40- Yadoyê Dimilî
41- Zembilfroş

# Pêşketinên Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di Şoreşa Rojava de

Di şoreşa Rojavayê Kurdistanê de yek ji serkeftinên herî mezin avakirina sîstema xwendinê û vejînkirina zimanê dayîkê bû. Zanîngehaên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi fikirên modernîteya Demokratîk tên birêvebirin. Girêdayî vê yekê hevserokê zanîngeha Rojava Şînda dawod anî ziman ku “zanîngeha Rojava xwe îsbat kir û em bi zanîngehên cîhanê re di nava têkiliyan de ne.”

**Zana Roj/ Qamişlo**


Bi şoreşa Rojavayê Kurdistanê û 19 ê Tîrmeha sala 2012 an de, gelê Kurd şoreşa vejînê ya doza azadiya gelê Kurd destpêkir. Bi hilbijartina xeta sêyemîn di kirîza Sûriyê de hêza şervanên azadiyê û gelê azadîxwaz û bi bedelên pir giran me gavên pir giring avêtin. Gelê Kurd bi hêz û baweriya xwe ya azadiyê, gelek destkeftiyên dîrokî bi dest xistin. Ev destkeftî roj bi roj mezintir dibin û gelê Kurd muhra xwe li dîrokê dixe. Yek ji destkeftiyên herî bi nirx yên ku rengê şoreşa rojavayê Kurdistanê guhartiye ew jî avakirina sîstema xwendinê û pêşxistina zimanê dayîkê ye. Zimanê Kurdî ji gavên sereke yên ku hatine avêtin bû û yekemîn dibistana Kurdî li Rojavayê Kurdistanê li bajarê Efrînê li gundê (Duraqliya) yê girêdayî navçeya Şera di 6/9/2011 an de hat vekirin. Di destpêka şoreşê de saziya ziman weke Saziya Zimanê Kurdî (SZK) dihat pênasekirin, fêrkirina zimanê dayîkê û rêzimana Kurdî bi awayê astan dihat dayîn û li ser 3 astan rêzimanê Kurdî dihat xwendin. Ev yek ji bo xwendekaran dibû bingeha naskiri û firbûna rêziman. Di demeke kin de Zimanê Kurdî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê weke minhac di tavahî dibistanan de hate xwendin. Sîstema xwendinê li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate rêxistin kirin. Ji dibidtanan ber bi vekirina peymangeh û zanîngehan, gavên mezin hatin avêtin.

**Yekemîn zanîngeh li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê zanîngeha Efrînê bû**

Yekemîn zanîngeh li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê zanîngeha Efrînê bû ku di sala 2015 an de hat vekirin û bi sedan xwendekarên Efrîn cihê xwe tê de digirtin. Di zanîngeha Efrînê de 6 fakolteyên zanistî û wêjeyî hebûn û fakulteyên heyî ev bûn (Bijîşkî, aborî, Ragihandin, ziman û wêjeya Kurdî, Mîkatronîîk û çandinî). Her wiha di nava sîstema zanîngehê de perwerdeyên paradîgma li ser mijarên cur be cur dihatin dayîn. Her wiha di bajarê Efrînê de 2 peymangehên bi navê Ş. Viyan Amara hatin vekirin. Di peymangehan de gelek beşên zanistî û wêjeyî hebûn, hejmarek mezin ji xwendekaran cihê xwe tê de digirtin.

Efrîna ku yekem dibistan bi zimanê dayîkê tê de tê vekirin. Di dîroka 20 Çileya 2018 an de dagirkeriya Tirkiyê û hêzên navnetewî êrîşê bajarê Efrînê kirin, bi biryareke navnetewî Bajarê Efrînê hat dagirkirin û bi darî zorê derbasî herêma Şehabyê bûn. Hejmareke mezin ji xwendekarên zanîngeha Efrînê piştî pêvajoya şer derbasî zanîngeha Rojava bûn. Her wiha xwendekarên ku amedehî li herêma Şehbayê bi dawî dikin, li gorî fakulteyên ku wê bixwînin derbasî zanînehên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dibin.

Di bin şert û mercên êrîşên dagirkeriyê û dorpêça hikumeta Şamê ve her wiha bi kêm derfeta û bi xwesteke mezin Li herêma Şehbayê di 2019 an de ji nû ve peymangeha Ş.Viyan Amara hat vekirin. Beşên ku cihê xwe tê de digirin ev in: (Mamosteya refê, biyeolojî, bîrkarî, fîziya û kîmiya, peymangeha tenduristiyê, zimanê îngilîzî her wiha beşa Kompiyoter jî hat vekirin).





**Zanîngeha Rojava 2016**

Piştî zanîngeha Efrîn, zanîngeha Rojava dûyemîn zanîngeh bû ku li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê tê vekirin bû û di sala 2016’an de hate vekirin. Zanîngeh destpêkê ji 4 fakulteyan pêk dihat( Zanistên perwerdehiyê, Çandinî, petrol û jiolojî). Piştî wê sal bi sal beşê fakulte û peymangehên wê zêdetir bûn.

Di sala perwerdeyê ya 2022-2023’an de, hejmara fakulte, peymangeh û beşên wê wiha ne: Zanîngeha Rojava 10 fakulte û 3 peymangehan dihewînê, navend û beşên wê wiha ne :

Fakulteya Bijîşkî, navenda wê li bajarê Qamişlo ye û xwendina wê 6 salin.

Fakulteya Zanista Siyasî, navenda wê li bajarê Qamişlo ye û xwndina wê 4 salin.

Fakulteya Endizyariya Çandiniyê, navenad wê li bajarê Qamişlo ye û xwendina wê 5 salin.

(Fakulteya Endizyariya Petrol û Petrokîmya) navenda wan li Rimêlane û xwendina wan 5 salin.

Fakulteya Endizyariya Avahîsaziya Ekolojî, navenda wê li bajarê Hesekê ye û xwendina wê 5 salin.

Fakulteya Wêje û Zanistên Civakî, navenda wê li Qamişlo ye, 6 beş in ( Wêjeya Kurdî, Wêjeya Erebî, Werger, Dîrok, Jîneolojî ) dihewîne û xwendina wan 4 salin, ji bilî beşê Wergerê ku 3 salin.

Fakuleteya Mafnasiyê, navenda wê li bajarê Qamişlo ye û xwendina wê 4 salin.

Fakulteya Zanist û Teknoelojya, navenda wê li Qamişlo ye û ji 7 beşan pêktê ( Mekatronîk, Kompyoter, Fîzîk, Kîmya, Zindînasî, Bîrkarî û Biyokîmya), xwendina wan jî 4 salin.

Fakulteya Zanistên Olî (Islamî li Hesekê, Êzîdî û Xirstiyanî li Qamişlo), xwendina wan jî 4 salin.

Fakulteya Perweredehiyê, navenda wê li Qamşilo ye beşên wê ev in (Mamostyeyên Refê, Rêbaz û teknîkên Fêrkirinê) û xwendina wan 4 salin.

Peymangeha Endizyariya Avakirinê navenda wê li hesekê ye û xwendina wê 2 salin.

Peymangeha Bilind Ya Ragihandinê navenda wê li Qamişlo ye û xwendina wê 3 salin.

Peymangeha Bilind Ya Zanistên rêvebertî û Darayayî navenda wê li Qamişlo ye û xwendina wê 3 salin.

Di derbarê Zanîngeha Rojava de, Hevseroka Zanîngehê Şînda ji rojnameya me re axivî û got: “Sîstema akademiyan ya ku zanîngeha Rojava xwe dispêriyê, ji projeya netewya Demokratîk a Rêveberiya Xweser ne dûr e. Her weha girêdayî fikrê demokratîk û rihê Şoreşa Rojava û şoreşa 19’ê Tîrmehê ye.”

**`Sîstema nirxandin û tevgera jiyana xwendekaran esas tê girtin`**



Şînda anî ziman ku sîstema ezmûnan xwe disipêre sîstema nirxandinê ya xwendekaran û li gorî wê pile ji xwendekar re tê dayîn û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Di sîstema piledayînê û ezmûnan de em ne wekî sîstema zanîngehên rêjîmê ne. Sîstema zanîngehên me cuda ye, wekî zanîngehên din ne tenê ezmûnek di dawiya salê de tê çêkirin. Ji bo diyarkirina çarenûsa wî/wê, di zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de bêtir sîstema nirxandin û tevgera xwendekaran di jiyanê de tê destgirtin. Di her werzerkî de ezmûnên dawiya werzê tên çêkirin. Her wiha nirxandinên rojane û mehane yên ku ji aliyê mamoste ve tên nirxandin di her qonaxekê de bi riya spartek û kiûyîz tên çêkirin. Li ser wî esasî encam û pileyên xwendekaran di dawiya salê de tê diyar kirin.”

**Peywendiyên zanîngeha Rojava** bi zanîngehên cîhanê re

Şînda di derbarê têkiliyên zanîngeha Rojava bi zanîngehên cîhanê re wiha got: “Ji bo pêşxistina zanîngeha Rojava gelek pirotokol bi zanîngehên cîhanî re hatin îmze kirin. Zanîngehên ku peywendî bi wan re hatine çêkirin jî ev in; zanîngeha Waşonton, zanîngeha Emerîkî, zanîngeha Firansî û em hewil didin bi zanîngeha Îtalî re pirotokolekê îmze bikin. Di heman demê de bi zanîngeha Almanî re periya 5 sala pirotokolek 5 salan heibû îmze kirin û wê ev pirotokol careke din were nû kirin.”

Hêjayî gotinê ye ku ji demazrandina zanîngeha Rojava ve 5 dewreyên derçûnê hatine derketin û hejmara xwendekaran 700 xwendekar bûn.

**Zanîngha Kobanê 2017**

Piştî rizgarkirina bajarê Kobanê ji çeteyên DAÎŞ ê, saziyên Rêveberiya Xweser û gelê Kobanê ji nû ve dest bi vejînkirina Kobanê kirin. Di demeke kin de ji cîhanê re îsbat kirin ku terorîst nikare li hember îradeya gelan bi serbikeve, piştî pêvajoya şer yek ji serkeftinên rêveberiyê aktîvkirina sîstema xwendinê bû. Meclîsa xwendinê li herêma Firatê dest bi avakirina dibistanan li Kobnê kir, her wiha yek ji gavên dîrokî ku hat avêtin, ew jî vekirina zanîngeha Kobanê bû. Di dîroka 10 Çileya 2017 an de zanîngeha Kobanê hat vekirin, destpêkê zanîngeha Kobanê tenê ji 2 fakulteyan pêk dihat, piştî wê sal bi sal beş û peymangehên nû dihatin vekirin, beşên ku cihê xwe di zanîngehê de digirin wiha ne : (fakulteya wêjeyî, fakulteya zanistên xwezayî, fakulteya perwerdehiyê, peymangeha tenduristiyê, peymangeha tekneolojî, peymangeha darayî, peymangeha ziman, peymangeha rêvebirinê û mafnasî, peymangeha bilind ya zanistên perwerdê, peymangeha bilind ya zanistên civakî).

Hejmara xwendekarên zanîngehê 771 in, yekem dewreya derçûnê di sala 2021 ê de bû, her wiha di sala 2022 an de 2 yem dewreya derçûnê pêk hat.

**Zanîngeha El Şerq 2021**

Zanîngeha El Şerq li bajarê Reqa yê di sala 2021 an de hat damezrandin, sîstema zanîngeha El Şerq mîna sîstema zanîngeha Rojava ye. Beşên zanîngehê wiha ne: (fakulteya Mavnasî, fakulteya endezyariya çandiniyê, fakulteya zanistên perwerdeyî, fakulteya wêje û zanistên civakî, peymangeha zimanê îngilîzî, peymangeha tekneolojî, peymangeha rêvebirin û darayî).

Zanîngeha El Şerq bû 2 sal hatiye demazrandin her wiha wê îsal yekemîn dewreya peymangehan wê derbiçin.



# Komkujiya Hewlêrê û xeta xiyantê ya PDK’ê

**Navenda nûçeyan**

**Dîroka PDK’ê bi xiyanetê dagirtiye, ji sala PDK avabûyî heya niha dijî Kurdan bi neyarên Kurdan re di nava têkiliyan deye û dijî Kurdan komkujiyan pêktîne. Yek ji xiyaneta PDK’ê, Komkujiya Hewlêrê ya di 16’ê Gulana 1997’an deye. Di encama êrişa bê bext de nêzî 80 gerîlayên PKK’ê yên birîndar ku di nexweşxaneya Hewlêrê de diman û xebatkarên nexweşxaneyê hatin qetilkirin. Hîn jî cenazeyê şehîdên Hewlêrê radestî malbatên wan nehatine kirin.**



**Komkujiya Hewlêrê çawa pêkhat?**

Komkujiya di 16’ê Gulana 1997’an li navenda bajarê Hewlêrê ya Başûrê Kurdistanê de pêk hat, hîna jî li benda ronîkirinêye. 26 sal bi ser komkujiyê re derbaz bû, di dîroka 16’ê Gulana 1997’an de hêzên PDK’ê bi leşkerên Tirk yên di bin navê Hêzên Aşitiyê ku li herêmê li ser kar bûn re, êriş kirin li ser gelek saziyên ku Heyva Sor a Kurdistanê jî di navê de bû, bi dehan kesên bêparastin qetilkirin. Tevî ku 26 sal li ser vê komkujiya Hewlêrê re derbaz bûye jî hîn jî cenazeyê kesên şehîd bûyîn radestî malbatên wan nehatiye kirin. Heya cihê ku cenaze lê hatine veşartin jî nayê zanîn.

Di sala 1997’an de di navbera PKK û PDK’ê de agirbest hebû û PDK’ê gotibu ku ew li dijî gerîlayan alîkariya leşkerên Tirkiyeyê nakin. Lê PDK’ê soza xwe pêkneanî.

Piştî ku PDK’ê soza xwe pêkneanî, çekdarên PDK bi awayeke hemwext hem êrişê nexweşxaneyê kirin hem jî êrişê Navenda Giştî ya Yekîtiya Netewî ya Demokratîk ya Kurdistanê (YNDK), ofîsa Navenda Çanda Mezopotamya ya Hewlêrê, Komeleya Yekîtiya Jinên Azad ya Kurdistanê (YAJK), êrişê rojnameyên Welat û Welatê Roj jî kirin û bi çekên giran van saziyan gulebaran kirin. Di êrişên ku li ser van saziyan çêbû de gelek mirovên bêparastin jiyana xwe ji dest dan. Operasyona binçavkirin û girtinê ya piştî êrişê dan destpêkirin, bi mehan berdewam kir.

Di encama êrişê de 52 gerîlayên birîndar, karmend û welatiyên li nexweşxaneyê hatin qetil kirin. Kesên ku hatîn dîl girtin jî piraniya wan hatin qetil kirin. Yanî PDK’ê bi hevkariya Tirkiyeyê bi giştî nêzî 80 kesên bê çek qetil kirin.

Piştî komkujiyê, PDK’ê cenazeyê gerîla û karmendên nexweşxaneyê radestî malbatên wan nekir. Tê gotin cenazeyê hinek ji kesên hatîn qetil kirin, li nêzî balafirxaneya Hewlêrê hatine veşartin. Xizmên kesên di komkujiya Hewlêrê de hatine windakirin û şehîdkirin û komeleya Hêvî ya ji bo piştgiriya qûrbaniyên şer, ji bo dîtina cenazeyê şehîdan bi salane daxwazname radestî lijneya Mafê Mirovan ya Parlamentoya herêma Kurdistan, Komeleyên Mafê mirov û Parlamentoya Iraqê kirine.

Li gorî daxuyaniyên malbatên şehîdan, hîn jî ti bersivek ji bo wan nehatiye dayîn. Tenê soza bi cihanîna daxwazên wan hatiye dayîn, lê di pratîkê de tiştek nehatiye kirin. Bi taybet PDK tucaran li ser vê bûyerê ne axiviye.

Careke din ev kiryar dubare dibin, PDK`ê dixwaze şerekî nû biafrîne ku xizmeta dagirkeriya Tirk dike. Ji 24`ê Nîsana 2021`an ve êrişên artêşa dagirker ên di bin navên cuda de li Avaşîn, Zap û Metînayê ranewestiyan ku bi hevkariya hêzên PDK’ê tên kirin.

Armanca van êrişan, dorpêçkirina PKK`ê di erdnîgariyeke teng de li Başûrê Kurdistanê ye. Yanî dixwaze bi temamî wan hêzên di çend salên bê de tune bike. Em dikarin bikaranîna çekên kîmyewî û hovîtiya şerê tê kirin, di vê çarçoveyê de pênase bikin. Lê destên NATO, Ewropa û DYA`yê de van êrişan de hene.

PDK`ê jî, Kurdên Rojava di bin navê Pêşmergeyên Rojava de di şerê li dijî gerîla de bi kar anîn. Lê ya rast ev pêşmerge, ji Rojava reviyan û li beramber pereyan bûn çete.

PDK`ê di 28`ê Tebaxa 2021`an de, li herêma Xelîfanê ya Başûr Kurdistanê, kemîn danî pêşiya komeke gerîla ku ji 7 şervanan pêk tê. Di encamê de 5 ji wna şehîd bûn û ji ber nebûna agahiyan, tê gotin ku yek dîl hatiye girtin. Yê din jî bi saxî vegeriya cihê xwe. Niha PDK`ê cenazeyên wan şehîdan li cem xwe dihêle û radestî malbatên wan nake.

PDK dijî Kurdan vê komkujiyê tenê ne kiriye, di roja me ya îro de jî bi dewleta Tirk re di nava hevkariyeke xurt deye. Bi taybet dijî gerîlayên azadiyê yên ku Kurdistanê diparêzin, di nava xiyanetek mezin deye. PDK bû sersebebê ku bi dehan gerîla bi gazên kîmyawî şehîd bikevin. PDK di roja meya îro de jî dibe sedem ku dijî sivîl û şoreşgerên Kurd, ji aliyê dewleta Tirk ve komkujiyên mezin pêkwerin.

# AMNESTY: 900 kes hatine darvekirin

**Navenda nûçeyan**

**Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (AMNESTY) derbarê darvekirinan de raporek belavkir û ragihand ku di sala 2022’an de nêzî 900 kes hatine darvekirin.**


Rêxistina Efûyê ya Navnetewî (AMNESTY) derbarê darvekirinên li cîhanê de raporek belavkir. Li gorî raporê di sala 2022’an de li 20 welatan 883 kes hatine darvekirin. Li gorî sala borî ji sedî 53 zêde bûye.

Di raporê de hate diyarkirin li Çînê par bi hezaran kes hatine qetilkirin û hejmar neketiye qeydan. Hate diyarkirin di sala 2021’an de hejmara darvekirinê 520 bû û di sala 2022’an de jî bûye 825.

Darvekirinên li Îranê di sala 2021’an de ji 314 bû û ev hejmar di sala 2022’an de jî bûye 576. Li gorî raporê Siûdî Erebistanê di rojekê de 81 kes dar ve kiriye.

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî diyar kir darvekirinên li dinyayê zêdetir e û got “Li Çînê hejmara kesên hatine darvekirin baş nayê zanîn û li vî welatî darvekirin gelekî zêde ne.”

Di raporê de hate diyarkirin li Kazaxistan, Papûa Yenî Gîne, Sîerra Leone û Komara Efrîkayê ya Navîn ev sûc hatiye rakirin û li Gîneya Ekvatorê û Zambiyayê jî bi tenê ji bo sûcên edlî darvekirin hatiye rakirin.



# Xelata “Giglio d’oro” Li Bajarê Filoransa Ji Bo Ş. Hevrîn Xelef Hat Dayîn

**Navenda nûçeyan**

Şaredariya bajarê mezin a Toscana yê Dario Nardella û meclîsa bajêr di 15 Gulanê 2023 an da xelata “Giglio d’oro” diyarî şehid Hevrîn Halef kir.Wekî tê zanîn girîngiya şaredariya Floransa yê di milê siyasî û dîrokî jî li ser vî esasî di paytexta eyaleta Toscana de ji aliyê serokê şarêdariye û bi biriyara meclîsa bajêr xelata “Giglio d’oro”piştî 10 salan cara yekemîn hat diyarîkirin li beramberî jinekî bi nasnameya xwe kurd û siyasetmedar xelata “Giglio d’oro” kulîlka sembola Floransaye û ev ji plaketekî zêr bi beşdarbûyîna xwîşk û xwarziyê şehîd Hevrîn Xelef li wan hat pêşwazîkirin. Şarêdariya bajarê Floransa Dario Nardella û meclîsa bajêr diyariya xelata “Giglio d’oro” ji bo bîranîna şehid Hevrîn Helef ya ku di 12 ê Cotmeha sala 2019 an de ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve hat hedefgirtin û şehîd ket. Ji ber Kar, xebatên wê û sekna jina kurd a siyasetmedar di şaxsê vê şevê dê hemu formên tundîtî li bermaberî jinan û ji bo parastina mafên rewa ya jina rojhilata navîn şevek hat rêvebirin.



Di heman demê de mêvanê ku li ser navê malbata şehid amade bun bi Dil germî hatin pêşwazîkirin û gerandina bajarê Floransa taybet cihên dîrokî bi bernameyekî ku Ji aliyê şaredariyê hatibû amadekirin pêk hat.

Di bernameya xelatê de beştarbûyîna komiteya kurd a Toscana, büroya enformasyonê ya Roma, Heyva Sor a kurdistanê ya İtalya, enternasiyonalistên italyan, dostên doza kurd, rexistinên mirovî û serbixwe, komiteyên Arci, Ampfi û malbata şehid Tekoşer Piling (Lorenzo Orsetti) amade bun.

Li ser girîngiya şevê Yılmaz li ser navê komiteya kurd,li ser navê Heyva Sor a kurdistanê Alican Yıldız,li ser navê malbata şehid Tekoşer bavê wî û li ser navê malbata şehid Hevrîn Xelef axaftin kirin. Beştarbûyîna aktîf ya pêkateya şaredariya Floransayê bi axaftinê ku şevê de hatin kirin dubare dilsoziya xwe ya bi gelê kurd û di şexsê Hevrîn Xalef dîsa şoreşa Rojava û girîngiya wê anîn ser ziman.

# Meclisa Kantona Efrîn û Şehbayê banga bidawîkirina dorpêçê kirin

**Navenda nûçeyan**

**Cîgirê hevseroketiya Meclisa Kantona Efrîn û Şehbayê Cemal Reşîd banga bidawîkirina dorpêça li ser kantona Şehbayê kir û destnîşan kir ku eger dorpêç bidome dê karesetên mirovî yên mezin encam bide.**

Hikumeta Şamê ji zêdetirî 5 salan ve, kantona Şehbayê dorpêç kiriye. Hikumetê ji Tebaxa 2022`yan ve ev dorpêç giran kir ku nahêle sotemenî, pêdiviyên tenduristiyê, derman û madeyên bingehîn ên jiyanê derbasî kantonê bibin. Ev dorpêç jiyana bi hezaran koçberên Efrîn û şêniyên kantona Şehbayê dixe xetereyê.

Hikumeta Şamê rê nade sotemenî, pêdiviyêm bijîşkî, derman û madeyên sereke yên jiyanê derbasî kantonê bibin ku ev yek jî metirsiyê dide bi deh hezaran koçberên Efrîbê û şêniyên kantona Şehbayê.

Cîgirê hevseroketiya Meclisa Kantona Efrîn û Şehbayê Cemal Reşîd der barê dorpêçê de ji ajansa me re wiha axivî: “Dema hêzên destwerdana Sûriyeyê kirine, li hev bikin, dorpêça li ser kantona Şehba û taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiye girantir dibe.”

**Zirara ji ber tunebûna sotemeniyê**

Reşîd wiha domand: “Bi girankirina tecrîdê re ev zêdeyî 9 mehan e, hêzên hikumeta Şamê rê nadin ku sotemenî derbasî kantonê bibe. Ji ber wê rêveberiya kantonê mecbûr ma ku demjimêrê embêran kêm bike. Ji ber ku ji beriya neha 5 demjimêr bûn niha rojane tenê 2 demjimêr in. Piştî wê Desteya Rêveberiya Herêmî di 27`ê Nîsanê de ragihand ku kehrebe bi temamî qut bûye.”



Reşîd destnîşan kir ku eger dorpêç bidome dê kareseteke mirovî ya mezin li herêmê encam bide û ev li gotinên xwe zêde kir: “Sotemeniya li ber destê me, pir kêm e. Nexasim ku binesaziya kantonê wêran bûye. Pêwîstî bi sotemeniyê heye da ku av bê derxistin, firin bixebitin, nan bigihêje şêniyan bi rêya komînan.”

Reşîd wiha pê de çû: “Di encama dorpêçê de rewşa tenduristî ya kantonê gelekî bi paş ketiye. Şênî êdî nikarin xwe bigihînin nexweşxane û navendên tenduristiyê. Ji ber rawestîna çûn û hatinê, gelek kes jiyana xwe ji dest dan. Nexweşxane û amûrên tenduristiyê bi kehrebeyê dixebitin. Ji ber wê divê jenerator her tim pêketî bin. Lê mazot peyda nabe. Heke dorpêç berdewam bike, dê nexweşxane raweste.”

Reşîd destnîşan kir ku ji ber nebûna maostê, çandinî bi paş ketiye û cotkar nikarin zeviyan av bidin û dest bi çinînê bikin.

**BANGEWAZÎ**

Di dawiya axaftina xwe de Reşîd banga bidawîkirina dorpêçê kir û got: “Em bang li hemû aliyên hiqûqî û mirovî dikin ku xwedî li erkê xwe derkevin û dorpêçê bi dawî bikin. Ji ber ku eger ev dorpêç bidome dê karesetên mirovî yên mezin li kantonê encam bide.”

# Rêgehên Asayîkirina Têkiliyan bi Şamê re û Niyazên Dewletan

**Navenda Rojava ya lêkolînên stratejîk**

Piştî deh salan ji şerê çekdarî yê kirîza Sûriyê, di vê dema dawî de hêmanên qonaxeke nû dest pê kir û diyar dibe, bi navnîşana asayîkirina peywendiyên bi Şamê re. Bi liv û tevgera dîplomatîk li Şamê û ji aliyê komkara erbî, herêm û cîhanî ve, ji milekî din ve jî kikumeta şamê jî seredanên li pey hev li hinek paytextên Erebî kir.

Kirîza Sûriyê û hebûna hêzên Rûsî ya heyî li ser xaka Sûriyê "firgeha serbazî ya Himêmîm û bingeha deryayî ya Tartûsê" sedemek bû ku Rûsiya karîbû li dijî Ukrayîna şerekî li darbixe, hingê kirîza Ukrayîna û dijkariya Dewletên Rojavayî û Rûsiya li Ukraniya kartêkirina vî şerî li kirîza Sûriyê jî bû, piştî erdheja malwêran ya ku li Tirkiyê, Bakurê Kurdistanê û Bakurê Sûriyê rûdayî, bû sedema xurtkirina tevgerên dîplomatîk bi Şamê re û peydakirina çareyekê ji kirîza Sûriyê re. Ew jî ji bo parastina berjewendiyên xwe ne ku ji ber berjewendiyên gelê Sûriyê ye.

Mirov dikare bêje ku du rêgeh ji bo asayîkirina bi Şamê re hene, rêgeha Rûsî û rêgeha Erebî ya hevalbendên Emerîkî.

**Rêgeha yekem "Rêgeha Rûsî"**

Ev rêgeh li ser vegerandina peywendiyên di navbera Tirkiyê û Sûriyê de bi rêya girêdana civînên çarqolî "Rûsî, Tirkî, Îranî, Sûrî"dirust dibe, ev jî ji bo dagirtina valahiya wê qelşa ku li têkiliyên Tirkî û Sûrî ketî ye, ku di dawiyê de bighêjin girêbesta lotkeya di navbera Erdogan û Esed de, da ku bigehîjin rêkeftineke dawîn di navbera her du aliyan de, ev rêkeftin wê pêbend be bi piştevaniya Tirkiyê ji birûbereyên çekdar yên terorîst li Bakurê Sûriyê û rakirina perdeya siyasî (danpêdana siyasî) ji ser Îtilafa Sûriyê û diyarkirina bernameyeke demê ji bo vekişîna Tirkiya dagirker ji Bakurê Sûriyê, her wesa xwestina Tirkiyê ku bi rêjîma Sûriyê re hevkariyê bike da ku şerê Rêveberiya Xweser bike. Her weha serastkirina rêkeftina Edena li gorî çikûsiyên Tirkiyê ji bo tunekirin û lawazkirina Tevgera Kurd li herêmê. Ji bo nimûne û pirojeyên demokratîk li deverê lawaz bike û ji bo derkirina hêzên Emerîkî ji Rojhelatê Feratê. Lê armanca Rûsiya ji vê rêkeftinê ku Tirkiyê di kirîza Sûriyê de û her wesa di kirîza Ukrayîna de her di xêza wê de bimîne û rêbendkirina hemû rêyan li ber Tirkiyê ku careke din venegere himbêza Dewletên Rojavayî.

**Rêgeha diwem"Rêgeha Erebî"**

Henek ji dewletên Ereb ên ku hevpeymanê Emerîkayê ne mîna "Şahnişîna Si'ûdî, Îmarat, Şahnişîna Urdinî û Misrê " dest bi vegerandina Sûriyê ji bo himbêzgeha Erebî û heman kursiyê di Komkara Erebî de, her weha rêtêbirina lîstina rolekê di nêzîkbûnekê di navbera Şamê û Rêveberiya Xweser de, lê belê li nik van dewletan jî metirsî hene li ser berfirehbûna Îranê li ser xaka Sûriyê û hebûna Tirkiyê û birûbereyên terorîst li Bakurê Sûriyê.

**Armanca Tirkiyê ji asayîkirina bi Şamê re çi ye?**

Pêşketina nişkave ya di siyaseta Tirkiyê derbarî kirîza Sûriyê de ku bêtirî deh salan e. Şer û pevçûnên ku li seranserî sûriyê têne jiyankirin, îro Tirkiyê dixwaze û hewil dide bi hikumeta şamê re lihevbike. Ev pêşkevtina nişkave di siyaseta Tirkiyê de ji ber nêzîkbûna dema hilbijartinên serokatiya Tirkiyê, ji milekî din ve jî derencama ku Erdogan nikare êrîşkariya xwe ya nû dijî herêmên Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhelatê Sûriyê pêk bîne, û dagirkirina deverên nû bike. Ji aliyekî din ve Rêveberiya Xweser bi hêza xwe bûye rastiyek û tu alî nikare wê piştguh bike. Serkeftina dîplomasiya Tirkiyê di cemserkirina (lixwekomkirin) dewletin herêmî û navdewletî ji bo danpêdan pê bibe weke Rêveberiya Xweser. Li gel piştevaniya Emrîkî û berdewamiya pişkdariya wê bi Hêzên Sûriya Demoqratîk re di şerkirina bi terorê re, û metirsiyê Tirkiyê ku dewletên Erebê asayîkirin û danpêdanê bi rêjîmê re bikin. Hingê zext dê li ser Tirkiyê pir bibin û daxwaza vekişînê ji Bakurê Sûriyê jê bikin. Lewra Tirkiyê ji bo berjewendiyên xwe hewil dide ku rêkeftinekê bi Rêjîmê re girê bide berî ku asayîkirina Erebî bi Rêjîmê re here serî.

Nikarîbûna Tirkiyê ji bo dagîrkirina deverin nû û tunekirina Rêveberiya Xweser û rawestandina piştgiriya Emerîkî ji bo QSDê ew neçar kir ku siyaseteke nû bi rêve bibe, ew jî ew e ku Tirkiyê dest ji gelek doseyan bikşîne û wan radestî hukumeta şamê bike, beramberî ku Rêjîm jî pê re hevkariyê di şerê Rêveberiya Xweser de bike û hêzên Emerîkî ji deverê derbixe. Lê belê Rêjîm baş têdigehîje ku eger demek jî were diyarkirin, Tirkiyê ji Bakurê Sûriyê venakişe. Ji ber ku çikûsiyên (ambargoyên) Tirkiyê yên dagirkerî li deverê hene "Peymana Milî" û bi hêsanî jê danakeve.

**Çi armanca Erebî "Si'ûdî" ji rahênana bi Şamê re heye?**

Di vê dema nêz de, gelek tevgerên dîplomatîk ji aliyê dewletên Erebî ve, ber bi Şamê ve û wekî din, li herêmê pêk hatin. Ev tevger bi tevgerên Tirkiyê re yên ku bi çavdêriya Rûsiya ji bo asayîkirina bi Esed re hevdem bûn. Mirov nikare bêje ku dewletên Ereb wekî Si'ûdiyê, Urdinê û Misrê" ku di vê qonaxê de dixwazin asayîkirinê bi Esed re bikin, ji ber gelek dosya hene, nemaze dosyeya berfirehbûna Îranê li ser xaka Sûriyê. Ew dosya hêjî negihiştine çareseriyekê û biryara asayîkirinê di destê Emerîkayê de ye. Ev dewletên Ereb jî hevalbendên Emerîkayê ne, jixwe Emerîka jî rê nade ku sizayên Qeyser werin şikandin. Lê ev tevgerên han jî ji bo rûbirûbûna hewilên Rûsiya ku dixwaze asayîkirinê di navbera Enqera û Şamê de dirust bike pêngaveke berepêş e. Her weha dibe ku bandorê li ser berjewendiyên Emerîkayê li deverê û li ser dijkariya wê li Ukarayîna bi Rûsiya re bike.



xuya ye ku niyazên Si'ûdiyê ji bo çareserkirina kirîzên deverê mîna kirîza Sûriyê û ya Yemenê jî hene û dawiyê li nakokîyên bi Îranê re bîne. Da ku xwe ji bo boçûn û dîtina aborî ya Mîr Mihemed bin Selman ya 2023an re vala bike. Ji ber ku ev kirîz berbendan li ber wê boçûn û dîtinê dirust dikin û wê dereng dixin. Her weha serdana serokê desteya hevbeş ya supayê Amerîka General Mark Milley ji bo Herêmên Rêveberiya Xweser û weke ku tê zanîn jî ku ev kêmî mehekî ye ku dibe serdana didiwan ya mezintirîn rayedarekî leşkerî yê Emerîkî ji bo deverê. Dibe ku hemahengî ji aliyê aborî û leşkerî ve bi QSDê re were avakirin, li beramberî rûbirûbûna tevgerên Rûsya-Îran û Tirkiyê.

**Destpêşxeriya Rêveberiya Xweser ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê:**

Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhelatê Sûriyê destpêşxeriyek ji bo çareserkirina kirîz û aloziya Sûriyê ragihand. Ew destpêşxerî jî di heman dema tevgerên herêmî ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê re hat. Ev tevgerên herêmî li gora pîvana berjewendiyên wan bûn, lewre jî nagehîje tu çareseriyeke giştî û dûmahîk a kirîza Sûriyê. Lê belê derbarê pêşkariyê ya ku tekezî li ser yekgirtiya xaka Sûriyê dike, vêca neh xalên din jî pê re hatine nivîsîn:

1- Pişkdariya hemû pêkhateyên civakê û danpêdan bi mafên wan yên rewa bike.

2- Ezmûna demoqratîk a li deverên Rêveberiya Xweser ku pêkan e, li hemû deverên mayî were pêkanîn.

3- Dabeşkirina saman û çavkaniyên aborî bi şêweyekî dadmend di navbera hemû deverên Sûriyê de.

4- Pêşwazîkirin û vehewandina penaberan li deverên Bakur û Rojhilatê Sûriyê.

5- Berdewamiya kar û xebata li dijî terorê.

6- Rawestandina mûdaxeleya Tirkiyê di kar û barên Sûriyê de.

7- Daxwazkirin û vexwendina dewletên Erebî ji bo ku roleke baştir di kirîza Sûriyê de bilîze û çareserîyekê hevbeş bibînin.

8- Divê destpêşxerî li ser binemayeke niştimanî be.

9- Vexwendina hemû aliyan beşdarî û pişkdarîkirin di vê destpêşxeriyê de.

Ev destpêşxerî weke baweriyê ji nik rêveberiya Xweser hate der ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê. Çareserkirineke hindirîn û bi dûmahîkirina nehameta gelê Sûriyê û avakirina Sûriyê li ser bingehên niştimanî hatiye avakirin ku pêkhate bighêje mafê xwe. Di serî de redkirina siyaseta jinavbirinê û karkirina ji bo rizgarkirina deverên dagirkirî û parastina yekîtiya xaka Sûriyê. Lê ji ber ku hikumeta şamê hîn ji çareseriyê dûre û heyanî neha bi erênî nêzî hewildanên rêveberiya xweser ji bona çareseriyê nebûye.

Çareseriya kirîza sûriyê wê bi riya destwerdanên derve pêk neyê. Berûvajî vê yekê, tenê wê çareserî bi riya danûsitandinên sûrî – sûrî pêkwere. Ji bona vê yekê pêwîste ku hemû pêkhate û aliyên sûrî cihê xwe di çareseriyê de bigrin. Hemû hêzên ku derbasî ser xaka sûriyê bûne û ji wan çi hêzên dagirker ên mîna dagirkerên tikr û çi hêzên ku ji bona bercewendiyên xwe derbasî ser xaka sûriyê bûne çareseriyê ji bona kirîza sûriyê nayînin holê.

Çareseriya kirîza Sûriyê ancax bi hevgirtina hêzên niştimanî û alî û partiyên ku ji bona çareseriyê kar û xebatê didine meşandin pêkan e.

## Insyatîfa Rêveberiya Xweser û dengvedana wê



**Dilyar Cizîrî**

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 18'ê vê nîsanê de insyatîfa çareseriyê ji aloziya Sûriyayê ya 12 sal li pişt xwe hiştiye re pêşkêş kir. Rêveberiya Xweser di insyatîfa ji 9 xalan pêk tê de xetên çareseriya demokratîk di çarçoveya yekparebûna axa Sûriyê û di çarçoveya biryara Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî ya 2254 destnîşan kir. Rêveberiyê her wiha ji welatên ereban û Neteweyên Yekbûyî xwest rola xwe di xebatên çareserkirina aloziya Sûriyê ya bandor li tevahî herêmê kiriye de cih bigirin. Rêveberiya Xweser her wiha destnîşan dike ew amadeye di herêmên xwe de pêşwazîkirina koçberên Sûriyê bikin. Helwesta Rêveberiya Xweser di mijara koçberên Sûriyê yên li Lubanê de baş zelal bû.

Ji ber aloziya koçberên Sûriyê ji hemû welatên cîranê Sûriyê re bûye pirsgirêkek mezin, insyatîfa Rêveberiya Xweser a di cih û dema xwe de hat, bala gelek aliyan kişand. Raste Hikûmeta Şamê li ser projeya Rêveberiya Xweser a çareseriya demokratîk tu helwest nîşan ne daye, lê mijar di nava civaka Sûriyayê de deng veda û bi awayekî berfireh nirxandn û nêrîn li ser hatin kirin. Di heman demê de ji aliyê ragihandinên cîhanî û herêmî ve jî gelek nirxandin û nîqaş li ser hatin kirin. Alîgirên dewleta Tirk, Îran û Hikûmeta Şamê jî di nîqaşên xwe de xwestin wekî hîlebaziyeke ji Rêveberiya Xweser e û bi vê jî hewldanên xwe yên reşkirinê û avakirina dijberiyan projeyê pêş bixin. Ji ber ew ditirsa wê de ne, agahiyên derbarê navbênkariya welatên Ereban di navbera Rêveberiya Xweser û Hikûmeta Şamê de çêbibe, bi taybet piştî Sûriyê vegeriya nava Yekîtiya Ereban.

Rastiya dijberiya wan jî di civîna 10'ê Gulanê ya Wezîrê Karê Derve yê hikûmeta Şamê Fêsel Miqdad, li gel hempîşeyê xwe yê Tirkiyê Mewlûd Çawiş oglu de diyar kiribû. Raste dibe ev civîn di çaçoveya civînên lihevanîna di navbera Hikûmeta Şamê û Tirkiyê de pêk hatibe. Lê ji lihevanînê zêdetir xalên wan ên serke dijberiya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tunekirina wê ye. Heger van welatan bi rastî xwestibana aloziya Sûriyê çareser bibe, wê ewqas dijberiya projeyên rêveberiya xweser ne kiribane. Lê ew naxwazin alozî were çareserkirin, domdariya aloziyê û belavbûna heyî sûdê li destildariyên wan dike. Welatên ereban jî di vê demê de dixwazin li dijî belavbûna madeyên hişbir û hebên kiptagon ên ji Sûriyê li welatên derdorê belav dibe, bigirin. Li gorî hin çavkaniyan ew jî dixwazin sûdê ji hêza Rêveberiya Xweser û saziyên wê yên leşkerî û ewlekariyê bigirin. Pirojeya Rêveberiya Xweser xetên çareseriya vê mijarê û mijara koçberan ku welatên cîran pira aciz dike, dibîne. Ji ber wê jî Rûsiya, Tirkiyê û Îranê di wê tirsê de ne ku cîhana ereban piştevaniya projeya Rêveberiya Xweser bikin.

Bi taybet di demekê de Sûriyê careke din vegeriya nava Yekîtiya Ereban, ew jî wiha hesaban dikin welatên ereban karibin di vê mijarê de roleke bilîzin û heta radeyekê bandor bikin. Ji ber wê jî wê Tirkiyê, Îran û Rûsiya bi hemû hêza xwe bixwazin rê li pêşiya pêşketinên muhtemel bigrin.



# Tecrîd sûcekî dijmirovî ye

Dewleta Tirk a dagirker roj bi roj tecrîda li ser Rêber Apo girantir dike, hevseroka Meclisa Edaletê ya herîma Efrîn Evîn Hac Hemo diyar kir ku tecrîd sûcekî dijmiroviye û got, tevî ku dewleta Tirk a dagirker tevahiya zagon û peymanên navnetewyî yên mafê mireovan bin pê dike jî, sazî û rêxistinên navnetewyî ji bo berjewndiyên xwe, xwe bêdeng dikin.

**Mihemed Xanim/ Qamişlo**

Hêzên civakî ku xwestine hebûna xwe ya civakî biparêzin, herdem li hemberî hêzên desthilatdar, di nava têkoşînê de ne. Kesên ku ji bo vê armancê ji civakê re pêşengî kirine jî, herdem bûne armanca hêzên desthilatdar. Ji ber ku hêzên desthilatdar dizanin ku bi têkbirina pêşengan, wê bikaribin civakê bixin bin destên xwe. Yek ji van pêşangan jî, Rêber Apo ye ku ji bo azadiya gelê kurd dest bi tekoşînekê bêhempa kir û bi pergala xwe ya Netewa Demokrat ji bo gelên bindest û azadixwaz bû hêviya serkeftinê. Li hember vê tekoşina azadiyê ku roj bi roj belavê cîhanê dibû, hêzên hegemon bûn yek û di encama komploya 1999'an de ku bi 'Komploya Navnetewî' tê bi navkirin, Rêber Apo dîl hat girtin û ev 24 sale di gîrtîgeha Îmraliyê de tê tecrîtkirin.



**Pergala Îmraliyê**



Girtîgeh Îmraliyê li giraveke Tirkiyê ye , di sala 1935'an de ji bo tecrîdkirina mirovan hatiye çêkirin. Di sala 1961'ê de jî serokwezîrê Tirk Adnan Menderes li vê girtîgehê hat bidarvekirin, herwiha derhênerê Kurd Yilmaz Guney jî demekê li vê giravê hat ragirtin. Herî dawî jî Rêber Apo di sala 1999'an de dîl hat girtin û ji wê rojê ve li wê derê tê tecrîdkirin. Rêber Apo navê "Çala Mirinê " li girtîgeha Îmraliyê dike, herwiha derbaê hêzên ku vê girtîgehê birêve dibin gotiye, 'Îmralî girêdayî Emerîka û Awrûpayê ye û dewleta Tirk jî nobedariya wê dike'. Ji destpêka dîlgirtina Rêber Apo û heta niha, dewleta Tirk rê û rêbazên nemirovî li dijî Rêber Apo bi kar tîne. Herwiha işkenceya derûnî û laşî lê dike. Dewleta Tirk a dagirker bi tu awayî qebûl nake ku mafên wî yên bingehîn bidiyê, herwiha agahiyên li ser çarenûsa wî eşkere nake. Dewleta Tirk a faşîst ji bo qedexekirina hevdîtinên malbat û parêzeran bi Rêber Abdullah Ocalan re, hincetekî bi kar anî ku têkiliya wê bi tu qanûnên hundirîn an jî navneteweyî nîne, ev hicet jî cezayên dîsplînê ye. Revandina Rêber Ocalan wek sûcekî navneteweyî ya serbixwe berdewam e. Encamên wê ji destpêka dîlgirtinê û heta niha berdewam in ku zirarekî laşî û derûnî yê mezin gihandin Rêberê Gelê Kurd ku fîlozofê serdemê û yê mirovahiyê giştî ye. Rêberkî azadîxwaz e ku ji bo azadiyê û demokrasiyê tê dikoşe.

**Li gorî zagonên navnetewyî tecrîd sûcekî dijmirovî ye**

Li gel revandina bi darê zorê û nebûna agahiyên rastîn li ser jiyana wî, ji zêdetirî 24 mehan ve, dewleta Tirk a qirker cezayên displînê li ser Rêber Apo feriz dike. Bi vêjî sûcekî diojmirovî yê din li sûcê xwe yê navneteweyî yê revandina Rêber Ocalan û kiryarên wê yên li dijî gelê Kurd û gelên ji azadiyê û demokrasiyê mehrûm mane, zêde dike. Di heman çarçoveyê de dagirkeriya Tirk di heman demê de li herêmên ku dagir kiriye û li tevahiya Kurdistanê sûcên herî hovane pêk tîne. Di heman demê de li gorî madeya 7`an a pergala Romayê ya dadgeha cezayan a navneteweyî ya Lahayê, sûcekî dermirovî li dijî Rêber Ocalan pêk tîne.

Li gorî madeya 5`an a Ragihandina Mafên Mirovan a Cîhanê, madeya 7`an a peymana navneteweyî ya mafên sivîl û siyasî ya sala 1966`an, ragihandina komeleya giştî a NY`yê ya 9`ê Îlona 1975`an ku di 10`ê Îlona 1984`an de hate erêkriin û bi hejmara 46/39 derketiye, madeyên 3-5-6-9-10 ên lihevkirina parastina mafên mirovan a Meclisa Ewropayê ku di 4`ê Mijdara 1950`î de derketiye, tecrîdkirina Rêber Apo û êrîşên ser gelê Kurd sûcên dijmirovî ne. Her wiha li gorî madeya 6`an a pergala Romayê ya dadgeha navneteweyî ya sala 1998`an, ji ber ku dewleta Tirk bi rêbazên cuda hewl dide Rêber Abdullah Ocalan tune bike, ev pêvajoya yekemîn a qirkirina komî ye. pêvajoya duyemîn jî êrîşkirina gelê Rêber Ocalan û dagirkirina axa ku li ser dijî û tunekirina wî gelê bi çekêm kîmyawî, ev jî sûcên dijmirovî ne.

Derbarê tecrîda giran ya li ser Rêber Abdullah Ocalan , hevseroka Meclisa Edaletê ya herêma Efrîn Evîn Hac Hemo ji rojnameya me re axivî.

Evîn diyar kir ku tecrîda girankirî ya ser Rêber Apo zagonên navneteweyî yên mafê mirovan binpê dike û wiha domand: "Ev tecrîd hemû zagon û peymanên navnetewî yên mafê mirovan binpê dike, ji wan zagonan jî, zagona netewî ya mafê mirovan ya 1948, peymana yekîtîya navnetewî ya 1945 û zagonên Nelson Mendêla. Armanca dagirkeriya Tirk ji tecrîdê, qutkirina gel ji Rêber Apo ye, herwiha dixwazin zextê li ser Rêber Apo çêbikin da ku mercên dagirkerîya Tirk qebûl bike."

**'Biryarên Rêxistinên navnetewyî li gorî berjewndiyên desthilatdaran e'**

Evîn derbarê helwesta CPT'yê wiha got: "Piraniya Saziyên hiqûqî û sivîl yên cîhanê ne serbixwe ne û biryarên wan li gorî armanca siyasetên dewletan ne, CPT'yê jî yek ji van rêxistina ye ku raporên xwe li gorî berjewendiyên siyasî yê Yekîtîya Ewropa derxîne. CPT pir caran Îmralî serdan kir û di raporên xwe de xiya kir ku li Îmralîyê azadî û demoqrasî tune û bû ye Girtiîgeha Gwantnemo ya duyem. Lê li ser rewşa Rêber Apo xwe bêdeng dike"

## Erdogan nekarî serkeftinê îlan bike



**Zekî Bedran**

Li Tirkiyê hilbijartin pêk hatin. Tevahî derdorên hindir û derve encamên hilbijartinên 14'ê Gulanê temaşe kirin. Erdogan û Baxçeliyê faşîst, tevahî derfetên dewletê bikar anîn û kampanyaya hilbijartineke ne adilane dane meşandin. Ev hilbijartin li cîhanê weke yek ji bûyera herî girîng a sala 2023'an hat pênasekirin. Erdogan û Baxçelî ji bo zexte li muxalefetê bikin xwestin weke eniya terorîst û xayînan nîşan bidin. Kampanyayek mezin a parçekirin û dijminkirinê meşandin. Erdogan lijneya Bilind a Hilbijartinê jî weke saziyeke herî jor zagonî kir û bi cihkirina endamên wê jî Erdogan bi xwe pêk anî. Di vî alî de hilbijartin manîpule kir û bergiriya xebatan girt.

Ji bo Erdogan desthilat hertişt e. Heman demê de partiyeke bi navê AKP'ê jî tune ye. Eger Erdogan di hilbijartinan de binkeve partiyek bi navê AKP namîne. Ji ber ku Erdogan hertişt bi amûra desthilatê bidest xistiye, eger hilbijartinê winda bike dê hertiştî winda bike. Di vî alî de Erdogan kesek wisa ne ku dê ji bona ku di hilbijartinan de binnekeve her tiştî bike. Tu nirxek exlaqî, zagonî, wijdanî li cem wî tune ye. Kesek ewqas ketiye ku heta di mitîngan de vîdeoyên montajkirî bikar anî.

Ajansa dewletê AA tam weke saziyek a AKP'ê hat xebitandin. Di ser vê ajansê re encamên hilbijartinê manîpule kirin, pê xerîk bûn ku hewayek weke Erdogan serkeftiye ava bikin. Êvara 14'ê Gulanê çawa sindoq vebûn, di deqeyên destpêkê de Erdogan li pêş nîşan dan. Kanalên muxalefetê jî ji bo li benda vê yekê bûn, bergiriyên xwe girtin û encamên hilbijartinê li ser kanalên xwe parve kirin. Eger ev bergiriyên muxalefetê nebûna, dê encamên hilbijartinê bihatibûna dizîn û Erdogan bi ser bikeftiba.

Sibeha 15'ê Gulanê hîn jî encam zelal nebibûn. Lê Erdogan nekarî serkeftina xwe îlan bike. Di rastiyê de Erdogan dizanîbû ku bi ser nakeve. Eger hilbijartinê bidize baş e, eger nebe jî mayîna Tura 2'emîn ji bo wî serkeftin bû. Ji xwe muxalefet bêzar kiriye, plan dikir hêza dewletê bikar bîne hilbijartina piştî du hefteyan jî qezenç bike. Jixwe hêza muxalefetê ya herî dînamîk yanî Kurd, hertim di bin operasyon û êrişên şerê derûnî de bûn. Çend roj man ji hilbijartinê re giranî dan girtinan. Terzek rêveberiyê ku Kurdan diperçiqîne û vederdike hatiye avakirin. Wezîrê Karê Derve Silêman Soylu di kampanyaya hilbijartinê de got "Erdogan ferman da, min jî dest danî ser tevahî şaredariyên HDP'ê, qayûm avêtin". Bixwe dibêjin ku zagon û hiqûqê nas nakin, di vegotina wê de jî tu pirsgirêkan nabînin.

Em dikarin bêjin partiyên muxalefetê kotûkêşek (badîre) mezin qevastin. Qet nebe serkeftina Erdogan asteng kirin. Hîn jî ev xeterî heye, lê wisa xuya dike ku ji bo vê lîstokê bilîzin dê herin Tura 2'emîn.

Piştî 21 salên ku Tirkiye pir xirab hat rêvebirin, hîn jî di parlementoyê de AKP û MHP piraniyê bi dest dixin. Ev rewşeke ku di aliyê zanista siyasetê ve pir balkêş e. Erdogan kîmyaya gel xirab kir. Bi çêkera civakî lîst, sermayê dest guherî. Şêlandin, dizî û çetetî asayî bû. Kesên ku nealîgirên desthilatê bûn hatin vederkirin, civak di astek bilind de parçe bû. Ol ji her demê zêdetir bû amûra polîtîkayê. Terîqet û cemaet zengîn kirin, bûn amûra desthilatê. Edalet û wijdan dan aliyekî. Ragihandin weke çekek kujer û jirêderketinê bikar anîn. Hindirê saziyan hatin valakirin.

Di demeke ku evqas wêrankariya civak û dewletê li holê ye, bêguman bendewarî hilbijartinek asayî nînin. Di dîmen de bûyer derneketin û hilbijartin hatin kirin. Lê mercên ji bo çêbûna hilbijartinek wekhev û adil ji holê hatin rakirin, hindirê pergalê hat valekirin. Pergala Erdogan ev bi salane ji bo hertişt bikeve destê kesekî dixebite. Li gel hertiştî nikarin bêjin tam serwer bûye. Ji ber ku gelê Kurd û hêzên demokratîk ên liberxwedidin hene. Ji bo vê berxwedanê jî bişkîne bê navber di nava şer de ye û êriş dike.

Tifaqa Ked û Azadiyê ku piranî ji Kurdan pêk tê, encama ku dixwest bi dest nexist. Pêwîste destkeftiyên wê kêm neyê dîtin. Lê hêz û potansiyela wê ji encama derketî pir zêdetir bû. Desthilata Erdogan hertim HDP di bin gefa girtinê de hişt. Her ku hilbijartin nêz bûn doza girtinê hat bilezkirin. Weke bergiriyekî HDP ne bi navê xwe, bi navê Partiya Çepên Kesk kete hilbijartinê. Niyet, coş û xwestek encama hilbijartinê diyar nakin. Di heman demê de hilbijartin li gorî hêjmaran e. Eger hûn girseya xwe nebin cihê qeyda wê û nebin ser sindoqan, deng pê nedin avêtin û sindoqan neparêzin hûn encam nagirin. Beşek girîng ê rêveberê xwedî tecrûbe û aktîf ên HDP'ê girtî ne, beşek jê hatine mişextkirin û girtin berdewam in. Li gel ku HDP di hilbijartinê de hêza diyarker bû, CHP û partiyên din nekarîn li dijî zexta li ser HDP'ê bisekinin. Dîsa li gel van hemû tiştan, Partiya Çepên Kesk dikarîbû encameke baştir bigire. Armanca wan derxistina 80-100 parlementerî bû. Di bin vê armancê de man. Bêguman ji bo encaman binirxînin û kêmasiyan derbas bikin pêwîste hîn zêdetir bixebitin. Dikarin di Tura 2'emîn de bibandortir bixebitin.

## Pêla nîjadperestî û bawerîanîna bi derewan



**Farûk Sakik**

Li Tirkiye û Bakûrê Kurdistanê, ew maratona hilbijartinan ku 2 mehe destpêkiribû, şeva 14'ê Gulanê bi encam bû. Her çiqasî hilbijartina serokkomariyê mabe tûra duyemîn jî, di vê hilbijartinê de 2 tişt zelal bûn. Di nav civaka Tirkiyê de pêla nîjadperestî û bawerîanîna bi derewan.

1- Me careke din dît ku nîjadperestî weke vîrûsekî li nav civaka Tirkiyê belav bûye. Erdogan di kampanyaya xwe de êrişî tevgera azadî û kurdan kir. Digot; Kiliçdaroglu bi PKK'ê re têkildare, serkeftina Kiliçdaroglu serkeftina PKK'ê ye. Li hember van propagandiyan Kiliçdaroglu û hevalên xwe jî, diketin pozisyona parastinê. Ew civaka nîjadperest baweriya xwe bi Erdogan anî û Kiliçdaroglu jî sûcdar dît.

2- Di siyaseta Tirkiyê de derket holê ku derew çiqas pere dikin. Civakeke ku ji derewan ewqas bawer dike li tu devereke din a cîhanê tune ye. Mînakek baweriya bi derewên Erdogan bikim; Li Şirnexê kesek di roportajên kolanê de ev bersiv da pirsa 'tuyê ji bo hilbijartinan dengê xwe bidî kê?"; Ku Kiliçdaroglu were wê mizgeftan bigire, îslamiyetê ji ortê rake û sergirtina jinan qedexe bike.

Erdogan û pirsporên sitratejiya siyaseta wî, ev yek ji berê de analîzkirin û li gorî wê stratejiyek pêşxistin. Di 14'ê Gulanê de me dît ku bi ser jî ketin. Encamên hilbijartinan li Kurdistanê serkeftîbû. Çima serkeftîbû? Erdogan, doza girtina HDP'ê weke argumanek hilbijartinan bikar dianî. HDP stratejîk tevgeriya û di bin navê Yeşîl Sol Partî de çû hilbijartinan. Di demeke kurt de danasîna vê partiyê zehmet bû. Ji ber vê yekê gelek dengê HDP'ê hatin betalkirin. An jî ji partiyên din re çûn. Di hilbijartinên parlamenteriyê de em dikarin bibêjin, HDP sekeftî bû. Partiyek ewqas bi êriş, girtin û ji mişextbûnê re rû bi rû maye, lê ku ev encam girtibe, serkeftî ye. Em hîle û diziya sindoqan jî didin aliyekî. Li her deverên ku deng dihatin bikaranîn, avakirina qereqolan jî em didin aliyekî. Kurd ev hemû bend, yek bi yek derbaskirin û ev encam bidestxistin.

Dîsa Kurd, bi dengê stratejîk ku dan Kiliçdaroglu jî serkeftî bûn. Ji Kurdistanê bi awayekî komî ji bo Kiliçdaroglû deng derketin. Ev jî nîşaneya wê yekê ye; dema ku sozekî bidin, heya dawiyê li wê soza xwe xwedî derdikevin.

Di rastiyê de hedefa esas çiwîna Erdogan bû. Lê nebû. Darbe xwariye û birîndar e. Ji bo çiwîna wî divê stratejiyeke nû bikeve meriyetê.

HDP (êdî em dîsa vegeriyan HDP'ê) jî kêmasî û xetayên xwe ji nû ve bide nîqaşkirin û dest bi xebatên xwe yên siyaseta demokratîk bikin.

Bê moralî, xemsarî, sûcdarkirinê dive ku bidin aliyekî û dest bi têkoşînê bikin. Têkoşîna kurdan tenê bi hilbijartin û parlementerîzmê pêk nayê. Gelek qadên têkoşînê hene.

Neyê jibîrkirin ku têkoşîna kurdan a 40 salî, di gelek badîreyan de derbasbûye û heta roja me hatiye. Ne bi tenê di hilbijartinan de, di hemû serdeman de êrişî kurdan kirine. Ji bo qirkirina kurdan, plan li ser planan xistine meriyetê, lê tu carî encam bi dest nexistine. Car caran dibe ku meşa têkoşîna doza Kurdistanê sist bûbe, lê di demeke kurt de xwe ji nû ve komî ser hev kiriye û têkoşîna ji bo azadiya Kurdistan berdewam kiriye.

Tiştek din; Tevgera azadiya Kurdistanê dema di siyaseta xwe de xetimiye, li gor paradigmaya Rêber Ocalan li rêyeke sêyemîn geriyaye. Heta roja me, ev xeta sêyemîn hemû pirsgirêkên li pêşiya doza azadiya Kurdistanê çareser kiriye.